

**DESTPÊKA ROMANA KURDÎ**

*Gotarên li ser Romana Êwra Kavkazê*

Edîtorên Kitêbê: M. Zahir Ertekin & Mehmet Yıldırımçakar

Nivîskar: Ahmet Seyari, Cihan Turan, Dilaver Döger,  
İlyas Sayım, Mehmet Yıldırımçakar, Mehmet Nur Yavuzer,  
Murad Celalî, Müslîh Sezer, Türkan Tosun

Weşanên Peywend: 64 | Lêkolîn & Rexne

Redaksiyon: Ahmet Seyari

Wêne: Luqman Ehmed

Berg & Mîzanpaj: Şemal Tarasım Ofisi

ISBN: 978-605-06451-4-9

Çapa Yekem: 2020

© Weşanên Peywend & Newzad Valêrî

Çap: Lorya Matbaacılık

Sertifika No: 47990

[www.lorya.com.tr](http://www.lorya.com.tr)

**PEYWEND**

Vali Mithat Bey Mah. Hastane Cad.

Nedim Odabaşı İş Merkezi A Blok, Kat 1 /33

İpekyolu / Van

Tel: +90 532 354 44 65

e-mail: [peywend2020@gmail.com](mailto:peywend2020@gmail.com)

Web: [www.peywend.com](http://www.peywend.com)

## I.

# SERLEHENGÊN JIN DI XEZALA SÎMA SEMENDÊ Û MESTÛREYA TOSINÊ REŞÎD DE

TÛRKAN TOSUN\*

*“Serê me yê hêjayî tac e, em bin çarşevê vedişêrin,  
Çi fêde ji wê ku bextê min, ez awa nuxsan kirim”*

(Reşîd, 2010: 242).

### 1. Destpêk

Di nav kurdan de nivîsandina romanê di 1935an de, li gor cîhanê gelekî dereng dest pê kiriye, lê ber bi dawiya sedsala bîstemîn ve wekî cureyekî wêjeyî xwe îspat kiriye (Ahmedzade, 2011: 149). Ji wir pê ve di vê qadê de gav hatine avêtin û kurd jî wekî gelên din ji romanê bê par nemane. Ev berhemên gelemperî ji hêla mêran ve hatine nivîsandin jê gelek heta qirikê di nav siyasetê de mane (Yûsiv, 2011:10). Dema nivîskar mêr bin hingê agahiyên wî yên li ser jinê jî mêrane dibin (Aydoğan, 2014: 209). Lewra mêrên ku alaya wê qadê di destê xwe de digirin di berhemên xwe de jin wekî lehengên arîkar, pasîf û bireser teswîr kirine, li gor hest û fikrên xwe ew dane axaftin.

Virginia Wolf dibêje “Gelo haya we hejmara pirtûkên ku di nav salekê de li ser jinan hatine nivîsandin heye? Hûn dizanin ji van

\* Xwendekara Doktorayê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Zanîngeha Bingolê  
e-mail: tosunturkan@gmail.com

çend heb ji hêla mêran ve hatine nivîsandin? Haya we gelo ji we heye ku ( ji jinan re dibêje) hûn li cihanê hema bibêje jîndara herî zêde niqaş li ser tê kirin in?" (Wolf, 1988: 32). Wekî Wolf jî tîne ziman jîndara ku herî zêde li ser niqaş tê kirin jin e. Hejmara nivîskarên jin her çiqas li gor berê her ku diçe zêde bibe jî, hê têra xwe negihîştîye asteke bilind. Bi salan mêran li ser jinan helbest, roman, çîrok û hwd. nivîsandine. Nivîskarên jin ên ku gav avêtine qada edebiyatê jî ji vê xelesa teng derneketine û hema li ser vê şopê meşiyane. Wan jî di berhemên xwe de jin wekî lehengên arîkar, ên hêza wan kêmteswîr kirine. Lê di nav demê de hinekên ji vê sînorê derketine jî bi berhemên xwe dengê xwe dane bihîstin.

Di nav nivîskarên kurd de sedemên kêmasiya rêjeya nivîskarên jin helbet gelek in, lê yên sereke feodalîzm, siyaset, îktidara mêran, baweriya îslamê ya ku şaş hatiye şîrovekirin, şert û mercên civakê kurd ên tund, rêjeya xwendin û perwerdeyê ya kêmtir û qedexeya zimanê kurdî ne. Rewş çî dibe bila bibe hin jinên ku guh nedane van astengiyên û li hember civakê serî hildane derketine holê. Nivîskarên kurd ên jin 'ewil ji nav kurdên Ermenistanê derketine ku sedemên vê jiyana kolxozê ya hevpar, serbestiya zimanê kurdî, hebûna mafê jinan ê xwendinê, piştgiriya xebatên zimanê kurdî bûn ku nivîskara kurd Sîma Semendê jî berhema xwe ya bi navê "Xezal" di vê heyamê de nivîsandiye (Aydoğan, 2012: 330).

Di edebiyata kurdî de çawa ku nivîskarên jin kêmtir in, berhemên ku serlehengên wan jin jî her wisa kêmtir in. Heke çend berhemên ku lehengên wan ên sereke jin in bînin jimartin; çîroka Sîma Semendê "Xezal", çîroka Serfiraz Alî Neqşebendiyê "Heft Îşiyên Tirî", romana Egîdê Xudo "Dê û Dêmarî", romana Aram Gernas "Topa Lanetê", romana Zarîfe Demirê "Kela Bilind", Çîroka S. Lorîn Doğanê "Kirasê Teng" dikarin wekî mînakên navdar bînin nîşandan (Aydoğan, 2012: 330-331). Ji bilî van "Xatê Xanim" a Eliyê Evdîrehman û di demên dawî de romana Tosînê Reşîd "Mestûre Serê Wê Hêjayî Tacê Bû" û romana Bextiyar Elî "Qesra Balîndeyên Xemgîn" jî wekî berhemên ku serlehengên wan jin in dikarin bînin behskirin. Ev roman û çîrokên ku lehengên wan ên sereke jin in çiqas serkeftî ne û gelo gihîştîne armanca xwe? Ev mijareke din e, lê ya girîng ew e ku

li gor berhemên lehengên wan mêr in van berheman bala merivan kişandine ku ev jî xaleke girîng e.

Di vê xebatê de navê du jinan derdikeve pêş, yek ji wan Mah Şeref Xanim Kurdistanî ye ku wekî Mestûre Xanim (1805 - 1847) tê zanîn a din jî Sîma Semend e (1933 - 2008). Mahşeref (Mestûre) Xanim bi xwe serlehenga romanekê ye, nivîskar Sîma Semendê jî pirtûkeke çîrokan nivîsandîye ku hemû serlehengên wê jin in. Yanê pirtûkekê bifikirin ku nivîskar jin e, serlehengên wê jin in, bûyer li dora jinan diqewimin, jin der barê dahatûya xwe de biryarê didin û jiyana xwe bi xwe ava dikin. *Xezal* berhemeke weha ye, em dê di vê nivîsê de behsa *Xezala Sîma Semendê*<sup>1</sup> û romana *Mestûre Serê Wê Hêjayî Tacê Bû* ya Tosinê Reşîd<sup>2</sup> bikin.

- 1 Sîma Semend (1933-2008) yek ji nivîskarên kurd ên Ermenistanê ye ku di sala 1933an de li Axbarana Ermenistanê hatiye dinyayê. Malbata wê ya ji êşîra Rojkiyan qasî 180 sal berê ji Bidlisê koçî Sovyetê kiriye. Semend di sala 1958an de ji Fakulteya Filolojîyê ya Zanîngeha Rewanê mezûn bûye. Sîma Semendê di beşa kurdî ya Radyoya Rewanê de qasî 30 salan bernamêyên cur be cur -bi taybetî ji bo zarokan- çêkiriye, hevpeyvîn kirine û redaktoriya beşa kurdî kiriye. Heta dawîya emrê xwe ked daye zimanê kurdî. Mêrê wê rewşenbîrê kurd Karlanê Çaçanî ye û çar qîzên wan hene. Sê berhemên wê; *Xezal* (1961), *Du Şahî* (1967) û *Guman* (1982) hene. Têmurê Xelîl di bernamêyê Radyoya Rewanê ya bi navê "35 Helbestvan û Nivîskarên Kurdên Sovyeta Berê" de bi hurgilî behsa Sîma Semendê dike. Xelîl di beşa "Ewê 50 Salan Xizmeta Çand û Edebîyeta Kurdî Kir" de der barê Semendê de agahîyan dide û berhema wê ya bi navê *Gumanê* jî dixwîne. Li ser vê linkê bernamê dikare bê guhdarîkirin (Xelîl, 2017: 1).
- 2 Tosinê Reşîd (1941-) di sala 1941an de li Kurekenda gundê Ermenistanê hatiye dinyayê. Malbata wî jî wekî gelek malbatên êzdî ji Serhedê reviyaye Sovyetê (ji Îdirê çûne). Heta pola çaremîn li gundê xwe perwerde dîtîye, dû re xwendina xwe li gundê cînar domandiye. Di sala 1959an de dest bi Enstîtuya Perwerdeyê ya Fakulteya Fîzîk-Matematîkê kiriye. Di 1975an de bûye doktorê zanyariya kîmyayê û salên dirêj li Zanîngeha Rewanê mamostetî kiriye. Di 1963an de bi Gêorgiyê Xudo, Zurbê Emir û Titalê Efo re yekemîn komeleya kurdî ya Yekîtiya Sovyetê ava kiriye. Gotara wî ya 'ewil di 1961an de di Rojnameya Riya Teze de hatiye weşandin. Di 1957an de dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Helbesta wî ya 'ewil di 1962an de di Radyoya Rewanê de, çîroka wî ya 'ewil jî di 1966an de di Riya Teze de hatiye weşandin. Dîwana helbestên wî ya 'ewil bi navê *Kilamê Rê* (1975), ya duyem bi navê *Zozan* (1983) û ya sêyem jî bi navê *Nivro* (1987) hatine weşandin. Şanoyeke wî ya bi navê *Xecê û Siyabend* (1988) jî heye. Pirtûka wî ya bi navê *Ji Bo Bîranîna Qanatê Kurdo* di sala 2000an de hatiye çapkirin ku wî û Husên Hebeş bi hev re amade kirine. Êzdiyetî *Oleke Hê Ji Nenaskirî* (2004) pirtûka wî ya lêkolînê ye. *Şeva Bê Xew* (2000) û *Min Beriya Şevên Spî Kiriye* (2005) çîrokên wî

Di civaka kurd de ji bo mêran xwendin, helbestnivîsandin, çûyîna bajarên din, li gor dilê xwe zewac û hwd. li gor jinan tiştên normal û hêsan in. Jinên ku di bin civata nêr û zayendperest de dijîn ji bo ku van tiştan bi dest bixin, gelek caran têdikoşin. Ev tiştên ku ji bo mêran normal in û mêr tayîn dikin di van berheman de bi rêya serlehengên jin tên rexnekirin. Serleheng nîşan didin ku ev tişt ji bo wan jî heq e, ne qebahat e. Nivîskar- ku yek mêr û ya din jî jin e- qelema xwe li ser van xalên hevpar bi kar anîne ku em dê niha bi hurgilî behsa bûyer û lehangana bikin ka wan bi çavekî çawa li lehangên xwe yê jin nihêrine.

## 2. Kurteya Berheman

### 2.1. Xezal (Rewan-1961)

*Xezal* (Semend, 2015) cara 'ewil di sala 1961ê de li Rewanê bi tîpên kirîlî hatiye weşandin. Şefîk Kaya ji tîpên kirîlî guhastiye tîpên latînî û ew di 1996an de li Stockholma bajarê Swêdê di Weşanxaneyê Nûdemê de hatiye weşandin (Alakom: 1996, 92). Piştî çapa wê ya 'ewil a weşanxaneyê Nûdemê di sala 2015an de cara duyem Weşanxaneyê Avestayê berhem çap kiriye. Xezal 73 rûpel e û ji sê kurteçîrokên bi navê "Xezal", "Reva Rihanê" û "Mizgîn"ê pêk tê. Di her sê çîrokan de jî lehangên jin in, behsa jiyan û serpêhatiyên wan tê kirin. Sê çîrok jî di destpêkê de bi teswîra xwezayê û demsalê (bihar û zivistan) dest pê dikin, piştî bûyerên tîpî serê lehangên jin di dawiyê de bi encameke xweş diqedin, yanê serleheng digîhîjin mirazê xwe. Zimanê berhemê sade, zelal û herikbar e, ji ber vê çîrok bi awayekî rewan diherikin.

#### 2.1.1. Xezal

Di çîroka 'ewil *Xezal* a ku navê xwe daye berhemê, ji 33 rûpelan pêk tê de serleheng qîzeke kurd a bi navê Xezal e. Wekî gelek çîrok

---

ne. Romana wî "Mestûre Serê Wê Hêjayî Tacê Bû" (2005) cara 'ewil li Hewlêrê hatiye çapkirin. Hin berhemên A. Puşkin, L. Tolstoy, A. Çehov, A. Bûnin, A. Voznêsênski, A. Îsahakiyan, P.Sêvak wergerandine kurdî û çap kirine. Jina wî Nûra Cewerî, her du qîzên wî Zozan û Aza jî wekî wî li ser zimanê kurdî xebatan dikin. Tosinê Reşîd ji sala 1993an vir ve ye li bajarê Melbourneê ya Avustralyayê dijî (Reşîd, 2010: 3-4).

û romanên kurdî yê Sovyetê di vê çîrokê de jî dem bi dem behsa jiyana civaka kurd a êzdiyan, edet û baweriyên wan, xebata wan a li kolxozan, pesnê Lenîn, Partiya Komunîst, Şoreşa Cotmehê tê kirin, lê mijar li dora Xezalê difetilin. Xezal qîzeke rind, jêhatî, jîr û bixwebawer e, him dixwîne, him karê malê dike û him jî di kolxozê de dixebite. Armanca wê ew e ku bixwîne, bibe bijîşk û xizmeta gelê xwe bike. Lê car caran xwazgîniyên vê qîza kedkar derdikevin û hewl didin ku Xezalê ji kurê xwe re bixwazin. Wexta Henêya dêya Qaçax dixwaze ku bê xwezgîniyê wê, Xezal ji dêya xwe re dibêje; *“Dayê, gere te jê re bigota, bila badîhewa neyên, bila xwe sivik nekin û bila li wî kurê xwe, Qaçax e çi kureder e, jî şîretê bikin. Ew hê zaro ye, gede ye. Ew çi ye, zewac çi ye? Çav bi bejn û bala kurê xwe ketine lê, nizanin dara pûç e. Yekê bê hiş û feresat e”* (r. 12). Wekî ku ji dêya xwe re jî dibêje û nahêle kes bê xwazgîniya wê, di dawiyê de dixwîne, dibe bijîşk. Paşê vedigere gundê xwe (Elegez), nexweşan pak dike û xizmeta gelê xwe dike. Xezal di dawiya çîrokê de xortekî kurd ê bi navê Ahmo yê ku li Rewanê di zanîngehê de nas kiriye re dizewice. Yanê li ser wê rêya ku daye ber xwe dimeşe û digîhîje armanc û mirazê xwe.

Xezal dixwîne û dibe bijîşk, lê hevala wê ya herî nêzîk Karê, biqasî wê ne bişans e. Lewra bavê Karê rê li ber xwendina wê digire, nahêle ew bixwîne û hê biçûk e wê dide mêr. Sîma Semend di çîrokê de jiyana jina xwendî û ya nexwendî berawird kiriye, pergala Sovyetê ya ku azadiyê dide jinan da ku bikaribin bixwînin, bixebitin, li gor dilê xwe bizewicin bi devê Xezalê daye gotin: *“Erê dayê, ez razî me, ez ji jiyana xwe zaf razî me. Ji bo vê yekê em deyndarê Lenîne mezin û Partiya Komunîst in. Gereke em ji bo xebatê qeweta xwe nehêvînin. Divê em rind bixebitin, ku di vî welatê xwe yê serbest de komunîzmê çêkin”* (r. 13).

### 2.1.2. Reva Rihanê

Di çîroka “Reva Rihanê” - ji 27 rûpelan pêk tê - de behsa qîzeke kurd, Rihanê, tê kirin. Rihan ji xortekî bi navê Mirad hez dike û dixwaze bi wî re bizewice, lê Hesenê bavê wê guh nade hestên Rihanê û wê dide Casimê kurê Seydo Axa, yanê axayê gund. Xezêra dêya Rihanê hay ji evîna qîza xwe heye. Her çiqas axayê dewlennend qîza vê malbata feqîr layîqî kurê xwe dîtibe jî, Xezê naxwaze

qîza wê bêdilê xwe bizewice. Di çîrokê de behsa têkoşîna Rihanê ya li hember zewaca bêdilê wê tê kirin.

Xezê pir nexweş e, li ber mirinê ye, ji ber vê rewşê wesiyetê li mêrê xwe dike da ku ew Rihanê bêdilê wê nede mêr û gunehê keçikê nexe stûyê xwe. Lê Hesen wekî gelek mêrên kurd guh nade gotinên jina xwe û bi ya xwe dike. Rihan û Mirad ji ber ku bêçare dimînin, şeva dawetê bi arîkarî û piştgiriya hevalên Mirad direvin. Casim Axa li dû her du evîndaran dikeve, Rihan di wê xirecirê de bi guleyan birîndar dibe, lê ew ji destê Axê difilitin. Di dawiya çîrokê de xortên arîkariya evîndaran kirine xatir ji wan dixwazin û ji ber ku Mirad rêya qîzrevandinê li ber wan vekiriye, pesnê wî didin.

### 2.1.3. Mizgîn

Di nav berhemê de çîroka herî kin “Mizgîn” e, lewra ji 3 rûpelan pêk tê. Meriv wisa zen dike ku çîrok nîvco maye.<sup>3</sup> Qasî ku tê dîtî di çîrokê de sê lehengên jin û lehengekî mêr ê bi navê Selîm hene; Bêdîla dêya Selîm, Zînêya xwişka wî û Kawê. Kawê serlehenga vê kurteçîrokê ye, çavê wê li rêya destgirtiyê wê Selîm e ku ew ji leşkeriyê bizivire. Hatina Selîm a ji leşkeriyê ji bo hemûyan dibe mizgînî û bextewarî. A ku herî zêde şa dibe helbet Kawê ye, lewra hezkiriyê wê êdî ziviriye. Ji bo wê şabûneke wisa mezin e ku ew ji ber bextewariyê digirî û çîrok li vir diqede.

### 2.2. Mestûre Serê Wê Hêjayî Tacê Bû (Hewlêr-2005)

Romana Tosinê Reşîd *Mestûre Serê Wê Hêjayî Tacê Bû* cara ‘ewil di sala 2005an de ji hêla weşanxaneyê Arasê ve li Hewlêrê hatiye çapkirin. Çapa duyemîn jî di Gulana 2010an de ji hêla weşanxaneyê Ronahiyê li Amedê hatiye çapkirin. Roman bi tevî paşgotinê ji 301 rûpelan û du beşên sereke pêk tê. Di bin van beşan de jî binbeşên cuda hene. Navê beşa ‘ewil “Emanallah Xan” e û 10 binbeşan di xwe de dihewîne. Navê beşa duyemîn jî “Mah Şeref Xanim Kurdis-

3 Ji bo ku em der barê Sima Semendê û vê çîrokê de zêdetir agahî hildin me hewl de em xwe bigihînin qîzên wê. Gelek rewşenbîrên kurd ên ji Sovyetê gotin di destê wan de zêde agahî tune. Nivîskar û rewşenbîrê kurd Eskerê Boyik telefona qîza Sima Semendê “Zîn”ê da me, lê ev hejmara telefonê şaş bû û mixabin me xwe negihand malbata Semendê ku em zêdetir agahiyan bi dest bixin.

tanî” ye û ew jî ji 14 binbeşan pêk tê. Roman ji ber 200 saliya jidayikbûna şair û dîroknûsa kurd Mah Şeref Xanima Kurdistanî hatiye nivîsandin.

Romana *Mestûre Serê Wê Hêjayî Tacê Bû* behsa jiyana helbestvan û dîroknûsa kurd Mah Şeref Xanim Kurdistanî<sup>4</sup> ya ku navê xwe di nav wan jinên navdar de daye nivîsandin, dike. Di romanê de her çiqas behsa dîroka Mîrektiya Erdelan, têkiliyên mîrekiyê yên bi cînan re, şer û pevçûnên di navbera mîrekiyên Baban û Erdelan de, bêtifaqiya kurdan, şerên Îran û Romê yên li ser axa kurdan, jiyana mîr û began a li qesrê, bi berfirehî hatibe kirin jî, kirdeya sereke ya romanê Mah Şeref Xanim e. Jina kurd a jîr û jêhatî ya ku ji ber îktidara mêran, feodalîzmê, dîn, civaka serdest û sedemên din her tim li pişt perdeyê maye, lê dîsa jî navê xwe daye bihîstin temsîl dike. Mah Şeref Xanim bi hewldana xwe wê perdeyê radike û derdikeve pêşberî dinyayê.

Di destpêka vê romana dîrokî de Mah Şeref Xanima 14 salî û bavê wê Ebûl Hesên Beg di bihara sala 1819an de diçin ziyareta Keleha Hesênabadê. Li wir ew jî qîza xwe re behsa dewra Emanallah Xan, jiyana Mîrektiya Erdelanê, şer û pevçûnên wê demê dike. Ev gera wan a li kelehê, axaftina bavê wê ya der barê dîrokê de, car

---

4 Helbestvan û dîroknûsa kurd Mahşeref Xanim Kurdistanî di sala 1805an de li bajarê Sinê (Senendec) hatiye dinyayê. Ji ber ku di helbestên xwe de mexlesa “Mestûre” bi kar aniyê wekî Mestûre Xanim jî tê zanîn. Kalikê wê Mihemed Axa di Mîrektiya Erdelanê de nazirê xezîneyê bû, piştî mirina wî Ebul Hesên Begê kurê wî (bavê Mahşeref Xanimê) tê li ser vê wezîfeyê. Ebul Hesên Beg yekî zana û jêhatî bûye, rê li ber qîza xwe vedike, wê baş perwerde dike ku ew kurdi, farisî û erebî baş hîn bibe. Mahşeref Xanim di sala 1828an de bi Mîrê Kurdistanê Sinê Xosro Xan re dizewice. Xosro Xan jî wekî wê helbestvan bûye û di helbestên xwe de ji xwe re wekî mexles “Neqam” bi kar aniyê. 6 sal piştî zewaca wan di 1834an de Xosro Xan ji ber nexweşiyê dimre û Mahşeref Xanim hê di emrekî ciwan de bi dimîne. Piştî mirina Xosro Xan kurê wî Riza Qulî Xan dibe mîr, lê şer û pevçûnên ji bo mîrekiyê dest pê dikin. Ji ber van şer û pevçûnan Mahşeref Xanim di 1843an de diçe Silêmaniyeyê û li wir bi cih dibe. Lê piştî salekê di 1844an de wefat dike. Gora wê li goristana Girdî Seywanê (Silêmaniyeyê) ye. Diwaneke wê ya helbestan ya bi farisî hatiye nivîsandin, pirtûkeke dîrokê ya bi navê “Ta’rih-i Ardalan” (Dîroka Erdelanê) ya behsa dîroka Mîrektiya Erdelanê (1169-1867) dike, risaleyê wê ya bi navê “Şerîeta Îslamê” ya ku behsa dîna îslamê dike, pirtûkeke wê ya bi navê “Mecmau’l-Udeba” ya ku behsa jiyana şair û nivîskarê dike û hin helbestên wê yên kurdi hene (Sagıncı, 2014: 172-179).



caran bi bavê xwe re çûyîna pirtûkxaneyê ji bo Mah Şeref Xanimê dibin nexşerêyên dahatûyê. Ev tişt li ber wê deriyê dinyayeke nû vedikin û dibin sedem ku ew bibe dîroknûseke navdar a kurd.

Roman paşê bi behsa dîroka Mîrektiya Erdelanê, Emanallah Xan, şerê di navbera Xan û Mehmed Hesên Xanê kurê wî yê mezin de dewam dike. Emanallah Xan ji ber ku ne Mehmed Hesên Xan, kurê xwe yê biçûk Xosro Xan wekî walî tayîn dike, kurê wî yê mezin Mehmed Hesên Xan li hember bavê xwe şer dide destpêkirin û tê kuştin. Paşê di berdewama romanê de Mah Şeref Xanim û Husên Qulî Xanê birayê Xosro Xan (her du jî kurê Emanallah Xan in) rojekê li pirtûkxaneyê rastî hevdu tên, ev qîza xama bala Husên Qulî Xan dikşîne û ev rasthatina wan dibe sedema evînekê (r. 70). Piştî rasthatina li pirtûkxaneyê romanê hema bibêje hêdî hêdî tenê li ser Mah Şeref Xanimê diherike. Her çiqas dilê wê jî bikeve Husên Qulî Xan, paşê ji ber sedemeke mecburî ew bi Xosro Xan re dizewice. Bi zewaca wê ya bi Xosro Xan re jiyana wê ya li qesrê dest pê dike. Piştî mirina Xosro Xan keder û xemgîniya ku dibe para wê, helbest û dîroknivîsandina wê dest pê dike û jiyana wê ya heta mirinê hemû di romanê de tê vegotin. Tişteke balkêş a li vir ew e ku Husên Qulî Xan jî, Xosro Xan jî mîrên zewicî ne û di romanê de hin caran behsa jinên her du birayan tê kirin. Heta wisa ku di dawiya romanê de dema Mah Şeref Xanim vedigere Silêmaniyê û Husên Qulî Xanê berê dilê wê ketibûyê û paşê dibe tiyê wê li wir li wê xwedî derdikeve lê jina wî qet dexesiyan li Mah Şeref Xanimê nake.

### **3. Portreya Fizîkî ya Serlehengên Jin**

Sîma Semendê der barê şikl, şemal û dirûvê lehengan de hema bibêje qet tişteke nenivîsandiye. Teswîrên berfireh û dirêj li aliyekê bigre, ji bilî çend sîfatên lehengan ên ku bi zorê di nav hevokên rûpelan de tên bidestxistin, der barê şikl û şemala wan de tu agahî tune. Tiştê hevpar a portreya fizîkî ya serlehengên jin ew e ku sê serleheng jî qîzên çavreş in. Çavreşbûn sîfateke xweşîkbûnê û pesîndayînê ye ji bo qîz û jinên kurdan. Di gelek stran, helbest û berhemana de tê bikaranîn ku şopên folklor û vegotina kurdî di xwe de dihewîne.

zanîngehê tê kirin îhtimal e ku temenê wê 17-18 salî be. Lê paşê dixwîne, dibe bijîşk û dizewice, çîrok ji ber ku wisa diherike temenê wê jî bi demê re mezin dibe.

### 3.2. Rihan

Rihan jî di çand û edebiyata kurdan de navekî taybet û navdar e ku ji bo qîzan tê hilbijartin. Ji bilî nav, gelek caran dema bejna keçikan tê terîfkirin dibêjin “takrihan”, “bejna wê wek rihanê ye”, “bêhna gul, sosin û rihanan jê tê” û hwd. Sîma Semendê di çîroka xwe ya duyem de navê lehenga xwe daniye Rihan û ew wekî qîzeke çavreş û lêvsor daye nasandin. Temenê wê nehatiye gotin, lê ji ber ku bav dixwaze wê zû bide mêr tê fêmkirin ew jî lehengeke pir ciwan e. Ji bilî van agahiyên kurt der barê wê de em ne xwedî agahiyên berfireh in.

### 3.3. Kawê

Lehenga çîroka dawîn a “Mizgîn”ê Kawê ye. Kaw tê wateya bimirês, bedew, law, rind, spehî, xweşik. Sîma Semendê navê Kawê ji wê re layîq dîtiye. Kawê qîzeke bejinzirav, çavreş û pordirêj e. Porê wê wisa dirêj e ku du guliyên wê yên reş wekî du maran li ser piştê wê tene xwarê. Di çîrokê de tê gotin ew li benda destgirtiyê xwe yê li leşkeriyê ye ku ew bizivire. Ji vê jî tê fêmkirin ew di navbera 16-18 salî de ye.

Wekî ku tê dîtin ev leheng jî dîsa wekî yên din çavreş e, yanî xwedî taybetmendiyeke hevpar e. Lê pordirêjbûna wê balê dikişîne, lewra por xemla jinê ye û di civaka kurdan de li ser por gelek tişt dikarin bên gotin. Mînak; porkurê, kezîkurê, porê hevirmiş, gulîzer, çilkezî, sî û şeş gulî, porxelek û hwd. Ev di nifir, şîn, şahî, stran, helbest, çîrok û romanên kurdan de ji bo jinan sifet in, hin caran jî wekî sembol û metafor jî tene bikaranîn.

### 3.4. Mah Şeref Xanim

Mah Şeref Xanima lehenga romana Tosinê Reşîd jî wekî lehengên Sîma Semendê xwedî sifaten hevpar e. Ew jî bi por, çav, bejn û bala xwe ve balê dikişîne. Porê wê wekî hevirmiş nerm, rast û dirêj e (r. 8). Yeke bejinbilind e, wisa ku li ser mêrê xwe Xosro Xan dikeve (r. 156). Di destpêka romanê de tê gotin ku bihara sala 1819an e, ji vê

tê fêmkirin ku ew 14 salî ye. Lê ji ber ku roman ji zewaca wê bigire, heta mirinê behsa hemû jiyana wê dike, heta roman biqede temenê wê jî helbet diguhere.

#### 4. Portreya Kesayetî û Rûhî ya Serlehengên Jin

##### 4.1. Xezal

Qîzeke jêhatî ye Xezal, him karê malê dike, him di kolxozê de dixebite û him jî dixwîne. Hemû karûbar li ser pişta wê bin jî ew di dersên xwe de serkeftî ye. Dilê xortekî bi navê Qaçax ketiye Xezalê, lê ew guh nade kurik. Baxçoyê hevalê Qaçax dema dixwaze hevalê wî dev ji vê evîna yekalî berde weha pesnê Xezalê dide:

*“Kuro, tu qet bi ya min nakî; Xezalê tu caran te nastîne. Weleh perda reş hatiye ser çavên te! Tu nabînî ew qet nizane tu heyî yan tuneyî. Lê ez ji te re rastiye bêjim: ew qet sêva devê te nîn e! Kuro, ew ê te tî bibe ser avê û tî bîne! Ew qîz ne li gor te ye, naşîtê naşît! Tu çi dibêjî mehrum, tu bi mêraniya xwe nikarî bigihîjî xebata wê. Tu nagihîjî wê ka binhêre em ketine. Em êdî ketine lê, wan lodeke bi qasî bejna te bilind kiriye û newestiyane jî...”* (r. 11).

Wekî Baxço jî tîne ziman ew yeke jêhatî û serwest e. Peyva “şê-rejin” hema bibêje ji bo yên wekî wê hatiye gotin. Ji bilî vê Xezal ewladeke gelek baş e, rêzê li insanan digire, qedir û qîmeta mezinan dizane. Ev keçika zana û baş ji dê û bavên xwe jî pir hez dike. Naxwaze dilê wan bişikîne. Yeke dilsoz û henûn e, car caran li ber dêya xwe digere û wê maç dike (r.12).

Xezal yeke îdealîst e, armancek daye pêş xwe û ji bo wê armancê bi şev û roj dixebite. Ev taybetmendî di gelek çîrok û romanên kurdî de derdikeve pêşberî me ku rastiyeke jiyane ye jî. Lewra jinên kurd ji bo ku di nav civaka tê de dijîn de neperçiqin û qedrê wan bê zanîn têdikoşin. Rohat Alakom jî balê dikişîne ser vê mijarê û ji bo jinan weha dibêje; *“...Ji alîkî de ew bi xurtî li dijî neheqiyên li wan bûyî, radiwestin, şer dikin, ji alîkî de jî wek pêşeng, rêber bi zanebûn û famdariya xwe rê nîşanî mêran didin...”* (2013: 41).

Xezal jî çawa ku bal hat kişandin her tim kedê dide, dixebite, dixwîne da ku di civaka ku tê de dijî de bi nav û deng be, jiyana xwe

û kesên din biguherîne. Qîza kedkar, jêhatî ya ku li dijî normên ci-vakê, sembolîze dike. Dema dêya wê di halê wê de dibêje û naxwaze qîza wê evqasî dersê bixwîne Xezal dibêjê: *“Meriv bê zahmetî nikare bigihîje mirazê xwe. Ez dixwazim bibim doktor ji bona vê yekê jî lazim e biçerçirim, bixwînim, hîn bibim de bikaribim îmtîhamên (azmûnên) qebûlîkirinê bidim”* (r.14).

Xezal heval û dosteke baş e, hewl dide Biroyê bavê Karê qanî bike ku ew jî qîza xwe bişîne mektebê, lê dema tiştê ji destê wê nayê vê carê li ber dilê hevala xwe dide. Derd, keser û xemgîniya hevala wê dibe ya Xezalê jî. Yanê bi tenê xwe nafikire, yeke xwehez, pozbilind û bêxem nîne (r.17).

#### 4.2. Rihan

Rihana serleheng jî wekî Xezalê qîzeke jêhatî ye. Ji ber ku dayika wê nexweş e qehra hemû malê li ser stûyê wê ye. Rihan kar û barê malê dike, piştî mirina dêya xwe li malbatê xwedî derdikeve. Keçikeke pir henûn û şermoke ye, gelekî ji dêya xwe hez dike. Piştî ku dêya wê dimire her tim diçe li ser gora wê û bi wê re xeber dide. Ev ziyaretên wê yên goristanê jê re dibe hêz û wekî ji terapiyê derkeve bêhna wê fireh dibe. Lewra ew li ser gorê, hemû derd û keserên xwe ji dêya xwe re dibêje, bi dilekî sivik vedigere malê.

Rihan wekî evîndar yeke dilsoz û bisebir e. Ji ber ku soz daye Miradê hezkiriyê xwe li ser soza xwe disekine, bi yekî din re nazewice. Mirinê dide ber çavên xwe û ji ya xwe nayê xwarê. Evîna xwe çend caran wekî “azadî” bi nav dike (r. 56), naxwaze bikeve nav lepên Casimê kurê Seydo Axa. Çiqas henûn û şermoke be jî naxwaze qedera wê bişibe qedera qîzên ku bêdilê xwe zewicîne û jiyaneke wekî di girtîgehê de dijîn, ji ber vê têdikoşe.

#### 4.3. Kawê

Kawêya destgirtiya Selîm heta ew ji eskeriyê tê çavê wê li rêya Selîm e, çav bernade kesekî din, tu şaşiyekê nake, yeke bi namûs û xîret e. Qîzeke delal, bedew û hêja ye. Gelekî jîr e mînanî pirîskê ye (r. 72 - 73). Ji ber ku ev çîrokeke pir kin e em der barê Karê de ancax van agahiyên sînorkirî yên ji çend hevokan pêk tên bi dest dixin.

#### 4.4. Mah Şeref (Mestûre) Xanim

Mah Şeref Xanima ku di nav malbateke arîstokrat, xwende û dewlemend de dijî her çiqas xwedî hin heq û destkevtiyan be jî, li gor nêrîn û hestên wê ev tişt têra wê nakin. Ji ber wê ew hewl dide bibe helbestvan û dîroknûseke baş (ev di civaka wê rojê de ne karê jinan e) û di dawiyê de ya xwe dike jî. Mah Şeref Xanim keseke zîrek, zana, jîr û jêhatî ye. Ji xwendinê pir hez dike, hê dema ku qîzeke xama ye bi bavê xwe re diçe pirtûkxaneyê, cihên dîrokî digere, pirsan ji bavê xwe dipirse û agahiyên nû hîn dibe. Ev zanebûn û aqilbûna wê li xweşa bavê diçe (r. 11-12). Ew yeke zîrek û xwende ye, rabûn û rûniştandinê dizane, dilovan û dilvekirî ye (r.149).

Mah Şeref Xanim sîwareke jêhatî ye, hespê bi çargavî dibe û tîne. Wisa baş hespa xwe dide bezê ku Ebul Hesên Begê bavê wê jê re dibêje “şengesiwar” û heyfa xwe tîne ku ew qîz e, ne ewladekî kurîn e. Dema Ebul Hesên Begê vê heyfa xwe tîne ziman dilê Mah Şeref Xanimê dimîne û ew xemgîn dibe. Lê bavê wê jê re weha dibêje:

*“Na keça min li ber dilê min pêçiyê te hêjayî sed kurî ye, ez keça xwe bi sed kurî nadim. Lê di vê dinyayê de, Xwedê xera bike, cihê her yekê ji berê de kifşkirî ye. Tu baş î, ne baş î, tu jîr û zîrekî yan nezan û tişt pênebûyî, gişk yek in. Û eger tu bixwazî li gor zanebûn û zîrekiya xwe lingên xwe bavêjî, piştî her gavê wê ji te re hasêgan çêkin. Dinya wê ji te re bibe dijmin. Vê carê sînorê karîna keçan heye. Tu çiqasî jî jîr û zîrek bî, tu nikarî ji wî sînorî derkevî. Û ew sînor gelekî ji sînorên kuran tengtir e” (r.13).*

Nivîskar bi van gotinên bavê ve rastiyeke civaka kurd aniye ziman û fikrên di binhişê bavan de veşartiyê derxistiye holê. Lewra her çiqas gelemperiya bav ji qîzên xwe hez bikin, qedrê wan biza-nibin jî hinek ji wan di dilê xwe de dibêjin “xwezî ew ewladekî kur bûbûya”. Ji hêla din li gor wê demê qîzek evqas azad û bê tirs tev-digere, bavê wê her tim piştgiriya dide wê, ev jî xaleke balkêş e ku nivîskarekî mêr lehenga xwe wisa azad teswîr kiriye.

Mah Şeref Xanim dema biçûk e cil û bergên kuran li xwe dike, hespê diajo û dixwaze bi kuran re bilîze (r. 68). Mah Şeref Xanim ji helbestxwendinê û nivîsandinê gelekî hez dike, ev hezkirina wê hê dema ku ew qîzeke xama ye dest pê dike. Mam Xosroyê berpirsyarê

pirtûkxaneyaya bajêr ji ber vê zîrekiya wê deriyên şîra kurdî li wê ve-dike (r.12). Mah Şeref Xanim dikare ji ber xwe helbestên Baba Tahir, Hafiz, Xeyam û Sadî bixwîne (r. 69).

Mah Şeref Xanim yeke şên, devken û geş e, pir ji dayîna xwe (Xezal) hez dike wisa ku bi wê re govendê digire, henekan dike, dev davêje wê (r. 80) Bi dayîna xwe re dek û dolaban digerîne, dike-ve pirtûkxaneyaya bavê xwe ku bi dizîka helbestên Husên Qulî Xan bixwîne (r. 88). Dayîna wê her tim piştta wê dike û karên wê yên veşartî pêk tîne.

### 5. Xalên Hevpar ên Serlehengên Jin

Di her du berheman de jî serlehengên jin (Xezal, Rihan, Kawê, Mah Şeref Xanim) kirde ne û bûyer li dora wan diqewimin. Wekî şanoyekê an jî fîlmeke ku di sînemayê de dilîze jin li ser dikê ne, her tişt li dora wan difetile, lehengên din arîkar in. Ev serlehengên jin ên di navenda berheman de ne keç û jinên serhildêr in, li hember rê û rêbazên tund ên civakê, feodalîzmê, zexta mêran a li ser jinê li ber xwe didin, têdikoşin û di dawiya dawî de bi ser dikevin, digihîjin armanc û mirazên xwe.

Ji bilî Kawê -ya ku serlehenga çîroka Mizgînê ye- di her du berheman de jî nivîskaran jin wekî kirde teswîr kirine. Ev leheng mekanên ku tê de dijîn diguherînin, ji bo merivan dibin mînak, diçin cih û bajarên cuda. Ev cihguhertin û çûyîn helbet jiyana wan diguherîne, tesîrê li ser hest, fikr û derûniya wan dike. Wekî mînak; Xezal ji gundê ku lê dijî (Elegez) diçe Rewanê da ku bixwîne û bibe bijîşk. Ev çûyîn jiyana wê bi tevahî diguherîne, lewra ew piştî xwendinê dibe bijîşk û bi Ahmo yê ku bi dilê wê ye re dizewice.

Serlehenga din Rihan jî her tim ji Miradê hezkiriyê xwe re dibêje “min azad bike”, qesta wê ya azadiyê ew e ku naxwaze bi kurê axê re zewaceke bêdil bike. Her çiqas gotina “min azad bike” ji kesekî bê xwestin û wekî helwesteke “pasîf” xuya bike jî di dawiya çîrokê de ew bi dilê xwe direve û azad dibe. Dema bi Mirad re direve û di nav wê xirecirê de birîndar dibe, dîsa jî dev ji evîna xwe bernade. Rihan jî cih û warê ku lê dijî derdikeve û diçe cihekî din. Jiyana wê jî helbet

*ewqas hêsîr û sitûxwar, kengê em ê jî bibîne meriv? Me jî wek merivan hesab bikin û me bi dilê me bidîne mêr*" (r. 55). Bi devê lehenga jin Zozanê gilî û gazina qîzên xama yên bi hezar salan e mêr guh nadin daxwazên wan, tê vegotin. Lê li vir jî Rihan serî li ber vê îktidara bav û wan edetan natewîne, kuştinê dide ber çavê xwe û bi hezkiriyê xwe re direve.

Mah Şeref Xanima ku bédilê wê tê zewicandin jî, di serî de vê zewacê naxwaze, lê paşê ji mêrê xwe hez dike. Di her du berheman de jî mijara hevpar ew e ku zewacên bi zorê, yên bédil tèn rexnekirin. Hemû serlehengên bi dilê xwe zewicîne jî ji ber zewacên xwe bextewar in.

Di çîrokan de xaleke hevpar a ku balê dikişîne jî dayikên serlehangin in. Ji ber ku nexwendine, rojê baş nedîtine, her tim di bin emrê mêr de jiyane; dixwazin qedera qîzikan neşibe qedera wan. Ji bo vê car caran gilî û gazinan dikin, car caran dilê xwe diavêjin jiyana qîzên xwe. Dêya Xezalê bi vê gotinê ferqa di navbera qîzên niha û yên berê de tîne zimên:

*"Lawo, hûn çiqas bextewar in. Hûn di welatekî weha azad de dijîn! Di orta mêr û jinan de ferq tune. Lê qîza min berê... Tişteki eyb bû, ku qîz di derheqa xwendinê de bifikiriyana. Hema belengazan hinekî çavên xwe vebikirana, ji dinê fêrî fikirana, hema ew didane mêr. Qet pirs nedikirin gelo qîz dixwaze yan naxwaze. Heke dê û bavê wê bixwestana êdî qîz çî bû! Ew didane mêr. Ew ne mêrkin bû, weleh hema hema ew difrotin"* (r. 13).

Serleheng li ber qedera xwe serî natewînin û dayik jî piştgiriye didin wan û li hember mêrên xwe (bav feodaliteyê temsîl dike) derdikevin da ku qîzên wan bixwînin, bibin xwedî pişe, li gor dilên xwe mêr bikin û zewaceke bextewar bibe para wan. Di romana Mah Şeref Xanimê de dayik li gor bavê pasîf e, zêde xuya nake, lê bav piştevanê wê yê herî xurt e ku dixwaze qîza wî bixwîne, ilm û îrfanê hîn bibe, li gor dilê xwe bizewice. Ji ber şert û mercan<sup>7</sup> Mah Şeref Xanim bédilê

7 Di pirtûka Feqî Huseyîn Sagniç ya bi navê "Dîroka Wêjeya Kurdî" de tê gotin ku Mah Şeref Xanim di berhema xwe ya bi navê "Dîroka Erdelanê" de behsa zewaca xwe dike û weha dibêje: "Di sala 1831'î de nexweşiya çavqûlke û reşane (weba) kete nava bajarê

xwe dizewice, lê dîsa jî per û baskên bavê her tim li ser wê ye. Bav piştî dawetê Xezala ku dayîna Mah Şeref Xanimê ye, dişîne cem, rewşa wê dide pirsîn û dixwaze bibêje 'her çiqas te mêr kiribe jî, ez bavê te me û li piştî te me'. Bavê Mah Şeref Xanimê her tim pesinê qîza xwe dide, hezkirina xwe bi tevger û gotinên xwe ve tîne zimên. Zewaca Mah Şeref Xanimê ji ber ku ne li gor dilê bavê wê ye, lê mecbûr dimîne qîza xwe dizewicîne, Ebul Hesen Beg jê re dibêje "Ji te re oxir be keça min. Serê xwe timî bilind bigire, tu hêjayî serbilindiyê yî" (r. 148).

Mecîdê bavê Xezalê jî piştgiriya dide xwendina qîza xwe. Dema wê dide mêr jî naxwaze qelenê qîza xwe bibire. Ji ber vê tê rexnekirin, him jî ji hêla jineke cînar ve. Dema jî dibêje; "nebirîna qelenê wê, dê qîzîkê bêqîmet bike", bavê Xezalê Mecîd dibêje ev edeta nebaş a "tucartiya merivan" berê bû û êdî ew dewr nema ye (r. 39).

Hesenê bavê Rihanê jî her çiqas qîza xwe bêdilê wê bide mêr û wekî bavekê ku ji qîza xwe hez nake xuya bike jî, Rihan di dilê wî de şêrîn e. Li gor hiş û baweriya wî heke Rihan ne bi şivanê axayî

---

Sineyê gelek kes heta kesên navdar jî ji ber vê nexweşiyê mirin. Piştî salekê ew nexweşî nema û ew ji herêmên din dîsa veqeriyên bajarê Sineyê. Wê çaxê dewleta Rûs ketibû nava tevger û hewldanan ku Îranê dagir bike û hin herêmên Azerbaycanê girtibûn bin kontrola xwe. Hin ji serok û rêvebirên kurdan ku ji aliyê Xusrew Xan ve hatibûne serkar, bi dizî ligel fermanîdarên rûs bûbûne yek û hevkarîya wan dikirin. Di wê navê de Huseyin Qulixanê xalê bavê min ku fermanîdariya Esfend Axayê ji wî hatibû standin, bavê min xapand ku alîkarî û hevkarîya wan bike. Bavê min wê çaxê xezînedarê walî bû. Piştî çend rojan haya Xusrew Xanê walî bi wê plan û komployê çêbû û bi wan hesiya. Wî planker hemû girtin û avêtin bendixaneyê. Hin ji wan gihîştine sezaya kirdeya xwe û bav û mamên min ku bêtawan bûn ji aliye Xusrew Xan ve hatin serbestberdan û her wisa ew hatin xelatkirin. Ji bo ku Xusrew Xan bikaribe dilpakîya xwe nîspet bi binemal û malbata me îspat bike, xwazgîniyên xwe şandin û ez ji xwe re xwestim. Wî daweteke bi şan û zor xweş ji bo me kir û ez bi wî awayî bi Xusrew Xan re zewicim û çûme nav rîza wê binemal û malbata mezin." (Saghiç: 2012, 173) Lê di romanê de agahiyeke berevajî vê heye ku tê gotin Xosro Xan bav û apê Mah Şeref Xanimê diavêje zindanê, lê paşê efû dike, berdide, bi sî hezar tûmenî ceza dike, hemû mal û hebûna wî ji dest distîne û bi zorê bi Mah Şeref Xanimê re jî dizewice. (r. 147 - 148) Jixwe di nav romanê de jî dilê Mah Şeref Xanimê 'ewil bi Husên Qulî Xan heye, lê piştî vê zewaca bêdil ew hêdî hêdî ji mêrê xwe Xosro Xan hez dike. Agahiyeke din ya ku romanê de tê gotin ev e ku Husên Qulî Xan xwarziyê Ebul Hasan Begê bavê Mah Şeref Xanimê ye. Ango Ebul Hesen Beg xalê Husên Qulî Xan e, (r. 67 - 68) lê di van hevokên jorê de agahiyeke berevajî vê tê gotin. Tosinê Reşîd di nivîseke xwe ya di Rojnameya Riya Teze de jî heman tiştî dubare dike (Reşîd, 2015: 1).



(Mirad), bi kurê axayî (Casim) re bizewice ew dê jiyaneke rehet û dewlemend bijî. Lewra wisa bawer dike ku Rihan piştî zewacê wê ji mêrê xwe hez bike û vê qenciya bavê xwe fêm bike (r. 55).

Di her du berhemana de aliyekî hevpar ê din jî ev e ku dayikên kurd ên serlehangana ji qîzên xwe gelekî hez dikin (bavê Mah Şeref Xanimê ji dêya wê bêtir jê hez dike) û ji wan re gotinên wekî “kevo-ka min”, “emrê min”, “delala dilê min”, “qurbana te”, “karxezala min” û hwd. dibêjin.

## 6. Derûniya Serlehangên Jin

Sîma Semendê di nav hemû serlehangana de herî zêde hest, fikr û derûniya Rihanê baş îfade kiriye. Ji ber ku dêya wê nexweş dikeve û dimire, bavê Rihanê wê dide mêr û dîsa ji ber ku hezkiriyê Rihanê li benda wê ye ku ew mecbûr dimîne bi wî re bireve, ev hemû bûyer derûniya Rihanê xirab dikin, ew di nav pelên xemgîniyê de avjeniyê dike. Sîma Semendê bêçaretîya wê ya li hember zewaca bizorê, xemgîniya wê ya ji bo mirina dayika wê, evîna wê ya dest û lingê wê girê dide, bi awayekî serkeftî aniye zimên. Hin caran ew bi berxan re, hin caran bi dêya wê ya mirî re û hin caran jî bi civîkan re daye axaftin da ku haya xwîneran ji hest û pelên li ser dilê wê diweşîn hebe.

Bêçaretî, xemgînî û bêsiûdbûna wê di çîrokê de baş hatiye vegotin. Wekî mînak Rihan derdê dilê xwe ji berxan re weha dibêje; “Ax, hûn heywanetên bê zar û ziman, hûn evîna dilan qet fêm nakin? Hûn pirs nakin gelo ez ji bo çi wa kerr û lal digrîm? Hûn qet pê dernaxin çima ez we timî maçî dikim, ne hûn herroj wî dibînin. Ax... Hûn nikarin... bêjine wî kula dilê min giran e” (r. 46).

Wekî ku hat gotin dêya Rihanê nexweş e û car caran ji qîza xwe re dibêje ku ew dê bimire. Rihana ku ji dêya xwe gelekî hez dike, dema bi tenê dimîne li ser nexweşiya dêya xwe û mirina wê difikire, xwe bi xwe diaxive û xemgîn dibe. Ji bo derûniya wê baş bê ditin, ev hevokên ji pirtûkê mînakên baş in: “Gelo dibe diya wê rast digot dê ew... Ax..., na, na, diya min dê pak be. Wê di ber dilê xwe dida. Ew nikare min tenê, situxar bihêle, na, ew ji xwe re dibêje, lew vê carê hinek xedar e” (r. 48).

Di cihekî din de jî Rihan xweziya xwe bi çivîkên ku azad difirin tîne û dibêje: “*Ev çiqas bextewar in, ne derdê wan heye, ne jî kulên wan, azad in, bi kur ve bixwazin, diçin, çî bixwazin, dikin*” (r. 51). Wekî ku tê dîtin, heta ku digihîje Mirad, derûniya Rihanê gelek caran nebaş e, ew tim xemgîn e.

Der barê hest, fikr û derûniya Kawê de em ne xwedî agahî ne, lewra çîrok bi tevahî sê rûpel in û tu hurgilî nehatine dayîn. Dema Selîm ji leşkeriyê tê Kawê gelekî şa dibe û ji ber vê şabûnê kelogirî dibe. Ji bilî vê agahiyê em nizanin ka di dilê Kawê de çî heye.

Ji bo derûniya Xezalê jî meriv dikare bibêje ew geh kêfxweş e, geh jî xemgîn e. Dema bavê Karê nahêle ew bixwîne, Xezal ji bo hevala xwe digirî û xemgîn dibe. Dema ezmunê qezenc dike diçe zanîngehê kêfxweş dibe û ji şabûnê difire. Gava dilê wê dikeve Ahmo ew dibe aşiq û kêfxweş e. Lê dema zanîngeh tetîl dibe û ew dizivire gund Ahmoyê xwe nabîne, bîra wî dike û her tim wî difikirê. Çaxê xeber tê ku Ahmo nexweş ketiye û rewşa wî giran e, Xezal li ser halê xwe de diponije û li benda destpêkirina zanîngehê namîne hema diçe û hezkiriyê xwe dibîne. Yanê gelek caran xwedî derûniyeke geş û baş e, lê hin caran jî xwedî derûniyeke nebaş e.

Dema Mah Şeref Xanim li mala bavê xwe qîz e, xwedî derûniyeke baş e, keseke şad û rûgeş e. Têkiliyên wê û bavê pir xurt in, ew gelekî ji hevdu hez dikin. Dayîna wê Xezal (jê re dibêje Xezo) ji bo wê keseke pir biqîmet e, henekan lê dike, pê re govendê digire û gelek tiştên xwe yên taybet bi wê re diaxive. Çawa dibêjin, haya wê ji bayê felekê tune, wekî qîzeke bê xem di mala bavê de dijî. Lê piştî zewaca xwe ya bi Xosro Xan re jiyana wê diguhere. Ew roja ‘ewil gelekî di ser halê xwe de diponije, vê zewacê naxwaze û derûniya wê nebaş dibe. Piştî demekê dema ji mêrê xwe hez dike, dibe wezîra enderunê, di nav jinên Xosro Xan de dibe jina ku herî zêde tê hezkirin, kenê li ser rûyê wê yê ku xatir xwestibû car din vedigere û ew kêfxweş dibe, derûniya wê jî baş dibe. Bi mirina Xosro Xan Mah Şeref Xanim êdî destê xwe ji jiyana dişo, xemgîniyeke daîmî xwe diavêje rûhê wê. Ji bo ku xwe aş bike û hinekî vê jiyana tahmsar sivik bike ew xwe bi nivîsandina helbestan mijûl dike.

Di rûh û haveynê Mah Şeref Xanimê de hê ji ciwantiya wê ve helbestwendin û nivîsandin heye. Piştî mirina mêrê xwe xem û

kedera wê zêde dibe, hema bibêje demeke mezin melonkolî pêşîra wê bernade û ew bi vê melankoliyê ve dijî. Ji ber ku ji vê zewacê zarokên wan jî çênebûne ev jî jê re dibe kesereke din. Piştî koçî Silêmaniyê dikin hesreta bajarê Sinê jî dilê wê disoje. Yanê meriv dikare bibêje ku jiyana wê ya kin gelek caran bi derûniyeke melankolîk, xemgîn, bi derd û keseran ve derbas dibe.

## Encam

*Xezal û Mestûre Serê wê Hêjayî Tacê Bû* di edebiyata kurdî de du berhemên girîng in. Her du jî ji hela nivîskarên kurd ên ji Sovyetê ve hatine nivîsandin. Xala wan a hevpar ew e ku serlehengên her du berheman jî jin in. Ev serleheng ne kesên pasîf û ji rêzê ne, ew kirde ne û bûyer li dora wan diqewimin. Bi hewldan û têkoşînên xwe ve ew him jiyana xwe digûherînin û him jî tesîreke baş li ser civatê dikin.

Tîpolojiya jina kurd a nexwendî a ku bi zorê tê zewicandin, qelenê wê tê birîn, mêr hikimê li ser dike di çîrokên Sîma Semendê de tê serobinokirin. Tîpolojiyeke nû ya berevajî vê tê avakirin. Serlehengek (*Xezal*) têkoşîneke xurt û hewldaneke mezin a ji bo xwendinê dide. Hemû serpêhatiyên wê nîşan didin ku xilasbûna jinan a ji bindestiya mêr û civakê bi saya xwendinê mumkun e, rêya azadiya jinê bi xwendinê pêk tê. Lewra jina ku bixwîne dikare bibe xwedî wezîfe, dikare di karekî baş de bixebite, mêrê xwe li gor dilê xwe hilbijêre û bi wî re bizewice. Civak wê demê rêz û rûmetê nîşanî jinê dide. Dîsa qîza ku bi zorê tê zewicandin (*Rihan*) serî li ber otorîteya bavê û civakê hildide, direve digihîje hezkiriyê xwe.

Bi jiyana serlehangên ve xwendin û nexwendin, zewaca bi zorê û ya bi dil, qelen, feodalîzm (bav, mêr, civak), jiyana beriya Şoreşa Cotmehê (1917) û ya piştî wê, baweriyên pûç ên bêbingeh hemû tînan berawirdkirin, rexnekirin û şîrovekirin. Di berheman de çawa ku behsa jinên ji ber kirîna mêran mexdûr bûne tê kirin, her wisa behsa jinên ku ji van mexdûriyetan filitîne jî hatiye kirin.

Di her du berheman de jî şopên folklor, çand û edetên kurdan xwe didin der. Qelen, zewaca bêdilê qîzan, keda jinan a di nav mal

û civakê de, qîzrevandin, rêz û hurmeta li hember mêr, bav û mezinan, dilhenûniya dêyan a ji bo qîzên wan û hwd. hemû baş hatine nirxandin.

Nivîskaran bi rêya lehengên xwe nîşan dane ku kesên ji rêzê ne û jiyaneke pasîv dijîn; wê bêdeng bimirin û navê wan wê bê jibîrkirin. Lê yên bi awayekî aktîf jiyane, êş kişandine, berdêl û ked dane; him di heyama ku tê dijîn de û him jî piştî mirinê wê tim bên bibîranîn û navê wan dê neyê jibîrkirin.

Herî dawîn rêya ku Sîma Semendê û Mah Şeref Xanimê vekiriye îro ji hêla gelek jinên kurd ve tê bigavkirin. Jinên kurd li gor berê êdî zêdetir dixwînin, dinîvîsin, lêkolînan dikin, li ser çand û edebiyata kurdî berheman zêde dikin. Ev xebata me jî di wê rêya ku hatiye vekirin de heke bibe gaveke biçûk wê bigîhîje armanca xwe.

## Jêder

Ahmedzade, H. (2011). *Romana Kurdî û Nasname*, Stenbol: Weşanên Avesta.

Alakom, R. (2013). *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyê Jinan*, Stenbol: Weşanên Avesta,

\_\_\_\_\_. (1996). "Cîhana Pirtûkan", *Kovara Çira*, j. 6., r. 91-92.

Aras, A. (2017) "Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê" <http://kovarabir.com/ahmed-aras-kilama-kurdi-u-denbejiya-serhede/>

(Dîroka Gihîştinê: 15.10.2018).

Aydogan, Î. S. (2014). *Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî Guman-2*, Stenbol: Weşanên Rûpel.

\_\_\_\_\_. (2012). "Dil ve Edebiyat Mutfağında Kürt Kadını". *Înatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*, Erbay, V. (ed.), Stenbol: Weşanên Ayrıntı.

Cindî, H. (2016). *Folklorê Kurmanciyê*, Diyarbekir: Weşanên Lîs.

Oremar, K. (2015), *Prensêsa Bê Tac û Text Eyşe Şan*, Diyarbekir: Weşanên Şaredariya Mezin a Amedê.

Perwer, Ş. (2011), "Xezal Xezal", <https://www.youtube.com/watch?v=pg3TiUcoKdw>. (Dîroka Gihîştinê: 16.04.2018).

Reşîd T. (2010). *Mestûre Serê Wê Hêjayî Tacê Bû*, Diyarbekir: Weşanên Ronahî.

\_\_\_\_\_. (2015). "Mestûre - Serê Hêjayî Tac Bû" <http://krd.riataza.com/2015/12/24/mesture-sere-hejaji-tac-bu/> (Dîroka Gihîştinê: 06.05.2018).

Sagniç, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Semend, S. (2015). *Xezal*, Stenbol: Weşanên Avesta.

Şakiro. (2016) "Lê Lê Qazê" <https://www.youtube.com/watch?v=yxwd1fYQZgo>, (Dîroka Gihîştinê: 15.10.2018).

Xelîl. T. (2017), "Ewê 50 Salan Xizmetî Çand û Edebiyeta Kurdî Kir" <http://krd.riataza.com/2017/12/14/ewe-50-salan-xizmeti-cand-u-edebiyeta-kurdi-kir-2/> (Dîroka Gihîştinê: 16.04.2018).

Wolf, V. (1988). *Kendine Ait Bir Oda*, Stenbol: Weşanên Afa.

Yûsiv, H. (2011). *Romana Kurdî*, Diyarbekir: Weşanên Ronahî.